# Ceza li Demîrbaş bariya

5'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê bi hinceta ku Şaredarê Sûrê Abdullah Demîrbaş beşdarî Roj TV'ê bûye û propaganda kiriye 2 sal û 6 meh cezayê girtîgehê lê birî

**Abdullah Demîrbaş ji ber kampanyaya "Ez dibêjim Birêz Ocalan" di roja 7'ê tîrmeha 2008'an de beşdarî ROJ TV'ê bû. Dadgehê bi îdiaya ku Demîrbaş gotiye "Li ser çand, ziman û nasnameya kurd her diçe êrîş zêde dibin, fikrên birêz Ocalan ji bo gelê kurd pir girîng in û di nav gel de jî tê parastin" ceza birî. Şaredar Demîrbaş destnîşan kir ku gotina 'birêz' nêzîkatiyeke însanî ye û divê bê bikaranîn. Lê ligel ku birêz Ocalan ji bo kurdan pir girîng e jî qanûnên Tirkiyeyê vê yekê li ber çavan nagire û li gorî hişmendiya înkar û îmhaya kurdan biryaran dide.**




# HAWAR

Rojnameya Rojane
6 Gulan 2009
Çarşem
Sal: 1
Hejmar: 1
Buha: 50 Kr


# Ne tore ye TEROR E

Li mezraya Zankirta gundê Çilkaniya navçeya Şemrexa Mêrdînê cerdevanan bi çekên dewletê dane wan bi ser daweteke de girt û 4 jê zarok, 17 jê jin bi giştî 44 kes bi awayekî hovane qetil kirin. Wezîrê Karên Hundir Beşîr Atalay got; 'bûyer ne teror e, tore ye'. DTP'ê aşkera kir ku êrîş bi çekên dewletê pêk hatiye û teror e



## Cenaze li cem hev defin kirin

*Beriya ku cenaze bên definkirin muameleyên otopsiyê yên 44 kesên hatine kuştin li morga nexweşxaneya Dewletê ya Mêrdînê hatin kirin. Hate ragihandin ku piştî muameleyan cenaze hatin definkirin. Her wiha destûr nehat dayîn ku rojnameger bikevin nav gund. Rojnamevan 500 metreyan li dûrî gund hatine rawestandin.*

### BI SER DAWETÊ DE GIRTIN

Li mezraya Zankirta gundê Çilkaniyan ya bi ser navçeya Şemrexê, dema daweta keça muxtarê berê Cemîl Çelebî, Sevgî Çelebî û Habîp Ari dihate lidarxistin kesên tevî dawetê bûn rastî êrîşa çekdarî hatin û 44 kes hatin qetilkirin.

### HIKÛMET: BÛYER TORE YE

Durûtiya hikûmetê di van bûyeran de jî bi dawî nebû. Ligel ku tevkujî ji aliyê cerdevanan ve hatiye kirin, hikûmetê hewl da ku bûyerê wekî kevneşopiya kurdan bide nîşandan. Balkêş e ku di hilbijartinê de rayên wir bi tevahî ji AKP'ê re çûne.

### GUNDEKÎ BALKÊŞ E

Gundê Zankirtê xwedî hin taybetiyên balkêş e. Ev gund ji mêj ve cerdevaniyê dikin. Bi hêza cerdevaniyê gundiyên nexwest cerdevaniyê bikin ji gund derxistin. Lê piştî demekê cerdevanan dest bi şerê navxweyî kir... R.3



*DTP'ê jî bi tevlibûna endamên Desteya Navendî û şaredaran heyetek şand gundê ku qetlîam lê çêbûye.*

## Piştî 400 salan jinek bû Poet Laureate

**HELBESTVANA** Îskoç Carol Ann Duffy di dîroka Îngilistanê de cara yekemîn nasnava wêjeyî 'Şair-i Azam' (Poet Laureate) girt û dîroka 400 salî xhilweşand. Jina bi navê Ann Duffy cara yekem nasnaveke wisa girt û di dîrokê de cihê xwe girt. Bi vî rengî jinek bo Poet Laureate... RÛPEL - 7

KOBANÎ:

## 'Muzîka kurdî ji berê baştir nîn e'

**HUNERMEND** Siyamend Oskullî got ku li rojavayê Kurdistanê muzîk û strana kurdî hinekî pêşketî û nû ye. Her wiha Oskullî, diyar kir ku li başûrê Kurdistanê hunermendên nû ji yên kevin serkeftîtir nîn in. Hunermend Oskullî, diyar kir ku li herêma Kobaniyê muzîkê destpêkê weke destanên dîrokî û bê rîtim dest pê kiriye... RÛPEL - 6

ENQERE:

## Ayna: Gelo çek ên dewletê ne?

**HEVSEROKA** DTP'ê Emîne Ayna ku di civîna koma partiya xwe de êrîşa li Mêrdînê şermezar kir, anî ziman komkujî asta ku cerdevanî gihiştiyê nîşan dide û pirsa gelo çekên di komkujiyê de hatine bikaranîn aydî dewletê ne an na kir. Ayna, da zanîn êrîş li hemberî DTP'ê hê jî didomin û wiha got: "Bi girtina riya siyasetê, riya çiyê nîşanî me didin."... RÛPEL - 4

## Edîtor

## HAWAR E !

Dema li ser miroveKî, komekê, an jî miletekî zilm û zordarî, zext û êrîş bi her awayî digihin asta herî dijwar, dema kêr digihîje hestî û hemû rê tên girtin, ew mirov, kom an jî milet bi dil û can, bi ruh û giyan serî radike, deng û qêrîna xwe bilind dike û dibêje: ÊDÎ BES E, HAWAR E!..

Her serîrakirina kurdekî ya li dijî her cureyî zilm û zordarî û neheqiyê weke hawarekê dest pê kiriye. Her serhildaneke gelê kurd a li dijî hemû kedxwarî, mêtingerî, dagirkerî, zilm û zordariyê weke hawarê dest pê kiriye. Ji ber vê yekê ye ku gotina 'hawar e û sed hawar e…' bi sedan salan e li ser zimanê miletê kurd belav dibe…

Va ye ji dused salî zêdetir e, li dijî hemû polîtîkayên hêzên serdest ên ku dixwazin kurdan tune bikin û nav û dengê wan, reng û nîşana wan ji holê rakin hawarek bilind bûye…

HAWAR'a ku di salên 1930'an de bi armanca parastin û pêşxistina ziman, çand û wêjeya kurdî, di pêşengiya C. Elî Bedirxan de dest bi weşana xwe kiribû dîrok û bi xeta xwe, bi naveroka xwe, bi rih û giyana xwe, di nava dem û dewranên gelek reş û tarî de ji bo gelê kurd bû ronahiyek, bû hêviyek, bû hêz û çavkaniyeke jiyanê.

***

Bi taybetî va ye ji 30 salî zêdetir e li dijî hemû êrîş û polîtîkayên hêzên dagirker û serdest, di pêşengiya Tevgera Azadiya Gelê Kurd de miletê kurd hawara xwe ya azadiyê, hawara xwe ya rûmetparastinê gihandiye asta herî bilind.

Her wiha di salên 1980'an de, di girtîgeha zindana Amedê de, li bin ewqas işkence, zilm û zordariyên mezin de, di pêşengiya şoreşgerê mezin Mazlûm de hawarek bilind bû. HAWARA BERXWEDANÊ. Ev hawar bi riya kovara HAWAR'ê jî ya ku di wan şert û mercên ewqas zor de ji aliyê Mazlûman ve hatiye weşandin bû dengê berxwedanê.

Hawara berxwedanê di nava demê de bi hezaran fedakarî û berdêlan vegeriya hawara serhildanê, hawara azadiyê û gelê kurd heta îro anî.

Îro jî, li dijî gelê kurd û Têkoşîna Azadiya Gelê Kurd bi her awayî tunehesibandin, helandin, jiholêrakirin û êrîş berdawam in. Ji ber vê yekê em dibêjin, HAWAR e.

Ji heft salî heta heftê salî, li dijî gelê kurd û hemû xebatkar û pêşengên Têkoşîna Azadiya Gelê Kurd êrîşên jiholêrakirinê û teslîmgirtinê bi her awayî didomin, ji ber vê yekê êdî bes e, HAWAR E.

Kêr gihîştiye hestî, ji ber vê yekê Êdî bes e û HAWAR e!

Û îro di demeke ku kurd herî nêzî azadiyê bûne de ji aliyê hêzên serdest û zordar jî bi her awayî zilm û zordarî, zext û êrîş zêde dibin. Ji van zext û êrîşan çapemeniya kurd jî para xwe digire. Rojnameyên bi kurdî tên girtin. Lê weke têkoşîna gelê kurd çapemeniya wê jî nasekine û li ber xwe dide…

HAWAR careke din xwe digihîne hawara me û dibe dengê gelê me.

HAWAR, dengê berxwedanê, dengê azadiyê, dengê yekîtiya gelê kurd e.

HAWAR, nav û nîşana zimanê kurdî, çanda kurdî, wêjeya kurdî û dîroka kurdan e.

HAWAR, deng û rengê we, qêrîn û hawara we ye…

Bi hêviya ku hûn li HAWAR'a xwe xwedî derkevin… MERHEBA!

## Hawar û sed hawar e!

Bi qasî Hawara malbata Bedirxan dê bi bandor be, bi qasî Hawara Zîndana Amedê dê berxwedêr be. Ev Hawar dê bibe qêrînek ji bo gelê kurd... *Nivîsa MEDENÎ FERHO - R.2*

www.arsivakurdi.org

**CUMA RONAHÎ**

# Êrîşkariya li dijî kurdan

Di ser hilbijartinên herêmî yên 29'ê Adarê re mehek derbas bû. Ligel ku ew qas dem di ser re derbas bûye dîsa jî cihê xwe di rojevê de digire. Geşedanên têne jiyîn nîşan dide ku hê jî bandorên wê dê bidomin. Dema mirov vê hilbijartinê û hilbijartinên berê dide beranberî hev bandora vê hilbijartinê bi awayekî zelal balê dikişîne.

Piştî hilbijartinên herêmî hikûmeta AKP'ê helwesta xwe raxistiye holê. Êrîşên di 14'ê nîsanê de li hemberî sazûmankarî û siyaseta demokratîk jî di nava vê rastiyê de cihê xwe digire. Êrîşên bi 14'ê nîsanê re jî di vê çarçoveyê de berdewam dikin. Di vê pêvajoyê de bi sedan însan hatin binçavkirin û girtin. Hêj çend kes bêne binçavkirin û girtin jî ne diyar e. Ev binçavkirinên heyî êrîşeke dij-kurd e. Di serdemên cuda ên dîrokê de li welatên cuda desthilatdarî hêz an jî beşên ku ji xwe re talûke didîtin, li hemberî wan êrîşên wiha pêk anîne. Li DYA'ê di serdema Mac Cartî de bi derxistina qanûnên dij-komunîst re binçavkirin, girtin û bidarvekirin di nava van êrîşan de cih girtine.

Serdema Mac Cartî ku di dîroka DYA'yê ya siyasî de di nava serdemên herî tarî de cih digire, kî weke talûke hatibe dîtin, rastî teqîbatê hatiye û avêtine girtîgehan. Mac Cartî bawer kiriye ku dê pêşiya talûkeyê wiha bigire. Lê, dîrok vê pêvajoya ku li DYA'yê hatiye jiyîn mehkûm kiriye. Di rastiya xwe de her çiqas hewce nake ku Tirkiye Mac Cartî ji xwe re weke mînak bigire jî, ji bo li Tirkiyeyê tiştên têne jiyîn baş bêne fêmkirin ew pêvajoya li DYA'yê hatiye jiyîn gelekî girîng e.

Bi girtinan re hatiye bawerkirin ku dê li DYA'yê Mac Cartî rê li pêşiya talûkeya komunîstî bigire. Hikûmeta AKP'ê jî riyeke wiha dişopîne, li gorî xwe ku fêm dike, bawer dike dê rê li pêşiya talûkeya kurd (!?) bigire. Jixwe, piştî hilbijartinên herêmî piştî civîna rêveberiya AKP'ê Cemîl Çiçek bi awayekî aşkera ev yek îlan kir.

Di rastiya xwe de ev îlana Cemîl Çiçek kiriye, tê wateya dayîna starta êrîşên 14'ê nîsanê. Piştî hilbijartinên herêmî di hikûmeta AKP'ê de ligel guhartina "vîzyon"a kabîneyê re ku Cemîl Çiçek cihê xwe diparêze ev yek nîşan dide ku dê êrîşên ku bi 14'ê nîsanê re hatibû destpêkirin berdewam bikin. Piştî hilbijartinên herêmî ku hikûmeta AKP'ê tercîheke wisa kiriye dê tiştekî bi Tirkiyeyê re nede qezenckirin. Bi taybetî jî, bi vî rengî bersivdayîna Hêzên Azadiya Kurd ku heta 1'ê hezîranê "rewşa bêpevçûn" îlan kirine dê hêj zêdetir bi wan bide windakirin. Ji bo ev yek bê fêmkirin jî hewce nake ku mirov pêşbînî be. Bi zêdebûna êrîşên li hemberî Hêzên Parastina Rewa, sazûmankarî û siyaseta demokratîk re rewş ku bi lez ber bi rageşî û pevçûne ve diçe pêşerojek çawa li benda Tirkiyeyê ye nîşan dide. Kesekî ku ne dîn be ne mumkûn e vê yekê biparêze. Lê, li Tirkiyeyê yên vê yekê diparêzin, her kes dizane ne sir e. Li hemberî îlana rewşa bêpevçûnê ya Hêzên Azadiya Kurd bersivdayîna bi operasyon û girtinan re tê vê wateyê.

Gelê Tirkiyeyê dê vê yekê heta kengî bipejirîne. Li Tirkiyeyê derdorên ji bo demokratîkbûn û aştiyê dilzîz in, dê heta ku derê bêdeng bin. Heke ev rewş wiha berdewam bike, li Tirkiyeyê li hemberî gelan dê sûc bêne kirin. Di êrîşan de mirov jiyana xwe jî dest didin. Ji vê yekê hikûmeta AKP'ê û kesên ji di vê polîtîkayê de israr dikin berpirsyar in. Heke li hemberî rewşa bêpevçûnê ya Hêzên Azadiya Kurd operasyon nehatina kirin, bêguman dê ew mirovina jî nehatina kuştin.

Ji ber vê yekê, gelê Tirkiyeyê û kesên aligirê aştiyê ne, divê pêsîra AKP'a ku di şerê kirêt-taybet de israr dike û kesên di vê polîtîkayê de israr dikin bigire, nehêlin ku cenazeyên mirovên hatine kuştin îstîsmar bikin. Berovajî vê hesab bipirse û van cenazeyan ji bo aştiyê bikin hincet. Li Tirkiyeyê piştî 29'ê Adarê pêvajoyeke nû hatiye destpêkirin. Ev pêvajo berovajî gotinên Cemîl Çiçek in. Cemîl Çiçek piştî 29'ê Adarê gotibû: "Gihîştin sînorê Ermenistanê, ev talûkeyeke stratejîk e ku di ser partiyan re ye." Ev, tê wateya piştî 29'ê Adarê ku li Tirkiyeyê şansê ji bo demokrasî û aştiyê hatiye bidestxistin dê bê windakirin. Tercîha hikûmeta AKP'ê kiriye ev rê ye.

Li hemberî hemû kurdan êrîş berdewam dikin, binçavkirin û girtin her diçin berfirehtir dibin. Li hemberî saziyên çapemeniyê yên alternatîf û azad girtin, qedexekirin bi cezayê pereyan û cezayên hepsê dixwazin îzalasyoneke biafirînin; ser pêkutî, kuştin û qetlîaman bêne nixumandin û li hemberî van kirinan dixwazin civakek bêdeng û bêbertek biafirînin.

Ji 1'ê hezîranê re demeke kurt maye. Lê ev dem ji bo Tirkiye û aştixwazan, demokrasîxwazan mirov nikare bêje demeke kurt e. Encamên ku 29'ê Adarê derxistin holê û bandora ku hêj berdewam dike ji bo vê yekê rêbaz derxistine holê. Ev rêbazên hatine afirandin weke heyî bênirxandin û veguheze awayê tevgerînê. Heger ev yek bi ser bikeve, di heman demê de tê wateya ev pêvajoya ku di 29'ê Adarê de dest pê kiriye ku hinek kes dixwazin vê pêvajoyê ber bi rageşî û şer ve bibin bersiveke ku ew heq dikin û tê wateya pûç derxistina siyaseta dij-kurd bûnê ye.



**Bizmar**

## Adil Zozanî

a_zozani@hotmail.com

### Niha jî dora Kongreyê ye

Sibata 2008'ê DTP'î ber bi Qesrokê ve meşiyabûn. Meşa bi dirûşma 'Li hemberî operasyonan meşa ji bo çareseriya demokratîk' pêk hatî, di heman demê de yekemîn çalakiya DTP'ê ya bêitiatiya sivîl bû.

Bi vê çalakiyê DTP'ê rêbaza xwe ya siyaseta aktîf guherand. Got: Ji niha şûn de em ê li ser esasê meşûyetê siyasetê pêk bînin.

Kirasê qanûnan ê ji bo siyaseta kurd teng dihat, bi vê çalakiyê hate çirandin.

Ji 6'ê sibata 2008'ê hate hilbijartinên 29'ê adara 2009'an DTP'ê li ser vî esasî siyaseta xwe pêk anî û ji vê rêbazê encameke xurt jî hate girtin.

Beriya hilbijartinên 29'ê adara axaftina bi kurdî li DTP'iyan hate qedexekirin. Sedemê vê qedexekirinê jî Qanûna Partiyên Siyasî bû. Lê DTP'ê di propagandaya xwe ya beriya hilbijartinê de ev kiras jî çirand. Ligel axaftina Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk a di civîna koma parlamentoyê de qanûn li ber helwesta siyasetmedarên kurd xitimî.

Pêşveçûnên piştî hilbijartinan heta niha bi gelek awayan hatin nirxandin. Bi taybetî operasyona 14'ê nîsanê ya li hemberî DTP'ê pêk hatî manîdar bû. Ji roja ewilê heta niha DTP'ê ev operasyon wekî darbeyeke li hemberî siyaseta kurd nav kir.

Çalakiyên xwe jî di çarçoveya vê navkirinê teşedan.

Greva birçîbûnê ya di 3-4'ê gulanê de li parqa Koşuyoluya Amedê pêk hatî jî li gorî vê hişmendiyê hate rêxistinkirin û pêk anîn.

Encamên vê çalakiyê di pêşerojê de dê baştir derbikevin holê. Lewre çalakiyên bi vî rengî dibe ku demildest encamên xwe ne din der. Di rojên pêş de em ê encamên vê çalakiyê bibînin.

Çalakiya DTP'ê ya parqa Koşuyoluyê bi aliyekê 'çalakiya xweparastinê' bû. Peyama xweparastina rewa bi vê çalakiyê hate dayîn. Di vê pêvajoyê ku DTP bûye hedefa êrîşan de çalakiyeke ku lêxwedîderketina gel a li DTP'ê pêwîst bû. Di nava du rojan de ligel zêdetirî 10 hezar kesên ketine grevê birçîbûnê zêdetirî 100 hezar kesî jî hatin parqa Koşuyoluyê û piştgirî dan grevê.

Ji bo DTP'ê ev lêxwedîderketin girîng bû. Lewre pêdiviya DTP'ê bi sînerjiyeke wisa hebû.

Di nava du rojên grevê me derfet dît ku bi gelek hilbijartiyên DTP'î re sohbetê bikin. Refleksa gel a li hemberî vê çalakiyê mereq dikir. Ligel ku jixwebawer bûn jî pêdivî bi vê yekê didît. Lewre, hemû DTP'î baş têgihiştine ku di vê pêvajoyê de divê hem di hundirê xwe de yekbûn û hem jî pirên di navbera wan û gel de xurt bibin.

Bi vê çalakiyê ev du peyam hatin dayîn.

Meseleya pirên di navbera gel û partiyê de pir girîng e. Lewre, dewlet dixwaze bi gel bilîze û baweriya ji bo DTP'ê qels bike.

Li cihekî wekî Colemêrgê dewlet çima tiştekî wisa bike? Bersiva vê pirsê pir aşkera ye. Dewleta di sindoqan de têkçûyî dixwaze gel vekêşe kolanê û tang û tifingên xwe nîşanî wan bide. Peyamên dîn ên vê çalakiyê ji bo dewleta tirk bûn. Dirûşma çalakiyê pir zelal bû: DTP'ê bêdeng nekin, çekan bêdeng bikin, rê li ber diyalogê vekin.

Ango êrîşbirina ser DTP'ê di heman demê de tê wateya pêlistina gelê kurd. Dema îradiya gelê kurd neyê nasîn, gelê kurd dê xwe bi rêbazên meşrû biparêz e.

Tevgera Kurd yekalî çek bêdeng kirine. Hûn jî bêdeng bikin. Dema çek bêne bêdengkirin dê rê li ber diyalogê bê vekirin.

Di nava vê peyama ku sê qonax tê de hatine destnîşankirin nexşeriya çareseriya pirsgirêka kurd de jî dihate hewandin.

Piştî vê çalakiyê em ê bendewarê 3'yemîn Kongreya Civaka Demokratîk bibînin. Di demeke kin de dema ev kongre pêk bê em ê nexşeriya siyaseta kurd a ji bo dema nû bibînin.

# Hawar û sed Hawar!

**MEDENÎ FERHO**

**Bi qasî Hawara malbata Bedirxan dê bi bandor, bi qasî Hawara Zîndana Amedê dê bi hişmendiyeke berxwedanê tevbigere. Her wiha ev Hawar dê bibe qêrînek ji bo gelê mazlûm ê kurd**

Ev navê rûmet û zimanê berxwedana bi xîret e.

Dema ku ev gotin bibin slogana mirovan û bi dil û can bibin armanc, helbet encam jî wê qonaxa îroyîn a serkeftinê be.

Berî salên 80'yî, serîhildan, têkoşîn û berxwedanên gelê kurd, bi "Kawa" dihatin binavkirin. Lê piştî berxwedana mezin a zîndana Amedê û çar xwedawendên ku darikên "derbikê" kirin findika ronahî û azadiyê; têkoşîn û berxwedana kurdan, wate û nirxa xwe guhert. Gihîşt asta hişmendiyeke felsefîk û di nava civata kurd de, wekî sîstemeke hemdemî û alternatîf derkete holê.

Ev mîrateya watedar û bi nirx, ji kîjan kar û xebat û berdêlên giranbuha derket û gihişte qonaxa îroyîn?

Di salên 1979'an de, dema ku dîlên azadiyê yên Tevgera Azadiya Kurd û hwd. hatin girtin. Di nava çar dîwaran de jî têkoşîn û berxwedana xwe, di her alî de domandin. Ev têkoşîn û berxwedan, ne tenê di eniya bedenî û fîzîkî de, di eniya hiş, raman û zanistî de jî kirin pratîkê.

Ji aliyekî ve perwerde, ji aliyê din ve rastiya dîrokî di çarçoveya hişmendiya zanistî de danîne meydanê.

Bi vê armancê, Mazlûm Dogan, Ferhat Kutay û hevalên xwe, di zîndanê de rojnameya Hawar derxistin. Ciwanên şoreşger, bi hiş û ramanê hemdem û têgihiştina şoreşgerî, bandora medya û rojnamegeriyê, çi rojnameyên dîwaran, çi bûroşûr, çi belavok, çi kovar û çi rojname baş dizanîbûn û bi vê armancê, li zindanê HAWAR derxistin.

Hawar di demeke kin de bû weşana kulturî ya zindanê.

Bi her girtiyê azadiyê cewherî digire nava tevgerê û dîtinên xwe, nirxandinên xwe dianîne ziman. Di demeke kin de Hawara Mazlûm û hevalên wî, bû çavkaniya, perwerdehî, têgihiştin û ragihandinê.

Ev dihate wateya ku armanca Ferhat Kutay, Mazlûm Dogan û hwd. di aliyê siyasî û îdeolojîk de, zanîna xwe parvekirin û têgihiştin û hewngîriya xwe bi hêz kirin. Ev armanca duyamîn ya derxistina Hawarê, di zîndanê de bû.

Ferhat Kurtay û hevalên wî, gelo çima navê rojnameya xwe Hawar danîn? Helbet armanceke dîrokî û siyasî hebû. Helbet armanceke soyolojîk hebû.



SAL 2
HEJMAR 21
YEKŞEMB
1 NÎSAN 1931

HAWAR

ANNÉE 2
NUMÉRO 21
DIMANCHE
5 AVRIL 1931

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

K – Q

Di elfabêya me de ev du herf bi hev guhêrîne: « k » keliye şûna « q » ê, û « q » keliye şûna « k » ê.

KURD Û KURDISTAN

31 ÇAVÊ BIYANIYAN

— 3 —

Kovara Hawar ku ji aliyê Celadet Elî Bedirxan ve, li Şamê, di sala 15'ê gulana 1932'yan de û bi tîpên latînî hate derxistin, têkiliya yekemîn ya bi demê û cîhana modern re ye. Lewra Mazlum Dogan û hevalên wî, ku di rojên pêş de wê bibin 'Kawayên Hemdem' û mohra xwe li serketinên mezin bidin, herikîna çemê dîrokê biguherin, rojnameya xwe ya bi navê Hawar kirin xeleka girêdanî. Yanî valahiya mezin a dîrokî dagirtin.

Baş tê zanîn ku piştî demekê Kovara Hawar, ji sedemên cuda hate rawestandin û mîna qonaxên dîrokî car din valahî kete heyamên jiyana kurdan. Jiyana civakî valahiyan erê nake û dema valahî ketin jiyana civakan, dîrok parçe dibe, sosyolojî tarûmar dibe. Paşerojên wê civakî darbeyên mezin dixwe.

Lewra Mazlûm Dogan û hevalên xwe, bi bîr û bîreweriya vê rastiyê, bi têgihiştina sosyolojîk, Hawar derxistin û bingeha rojnamegeriya kurd ku îro gihaye qonaxa profesyoneliyeke mezin amade kirin.

Li hemberî ku di sala 1919'an de, di nava kurdan de tîpên latînî hatibûn erêkirin jî, civaka kurd tîpên erebî bi kar tanîn. Yekemîn car e Celadet Elî Bedirxan, alfabeya latînî pratîze kir.

Mazlûm Dogan û hevalên wî, di zindanê de, di bin hoy û mercên herî giran de, ev mîrateya girîng û watedar domandin û valahiya dîrokî, di pirhêlî de dagirtin.

Ka çiqasî Hawara Elî Celadet Bedirxan, berê çapemeniya kurd guhert; Hawara Zîndana Amedê jî, pêşeroja çapemeniya kurd ku îro wek çapemeniya alternatîf derketiye holê, gihande roja îroyîn. Ev hawar jî dê gelek pencereyên nû di rojnamegeriya kurdî veke.

HAWAR
Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.
Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
Bedri ADANIR
Adres:
Kooperatif Mahallesi Gevran Caddesi 1 Geçit. Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis Yenişehir - Diyarbakır
TEL: 0 (412) 229 00 30
Fax: 0 (412) 229 00 39
Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A
Sefaköy - Küçükçekmece / İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 80
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstiklal mah. İstiklal. Cad. No: 44 Seyhan Edene
Yayın Türü: Süreli

www.arsivakurd.org

# Cerdevanan 44 kes qetil kirin

**Li mezraya Zankirta gundê Çilkaniya navçeya Şemrexa Mêrdînê cerdevanan bi çekê dewletê 4 jê zarok, 17 jê jin 44 kes qetil kirin. Kaplan got ev tevkujiya fermî ye**



Hate ragihandin ku bûyera li mezraya Zankirta gundê Çilkaniyê (Bîlge) ya girêdayî Şermexa Mêrdînê qewimî û 44 kes bi awayekî hovane hatin qetilkirin ji aliyê cerdevanan ve pêk hatiye.

Li mezaraya Zangirta gundê Çilkaniyê ya girêdayî navçeya Şemrexê, dema daweta keça muxtarê berê Cemîl Çelebî Sevgî Çelebî û Habîp Ari dihate lidarxistin kesên tevî dawetê bûn rastî êrîşa çekdarî hatin. Diyar bû êrîş ji aliyê cerdevanan ve pêk hatiye û di encamê de 44 kes hatine kuştin. Piştî êrîşê ji Amed, Mêrdîn, Şemrex û navçe û gundan gelek kes hatin gund. Kesên hatin gund piştî ji aliyê leşkeran ve di kontrola nasnameyan de hatin derbaskirin derbasî gund bûn. Leşker li derdorê bi dedektorê kontrola mayinan kirin. Ji ber li gundê Çilkaniyê telefana destan nakişîne, şêniyên gund ji bo telefon bikişîne derdikevin cihên bilind. Li gund hawarên jinan bê rawestan bilind dibin.

Qereqola Siltan Şexmûs 4 kîlometre ji gund dûr e. Rojek beriya bûyerê di navbera aliyan de nîqaş derket. Nîqaş di asta devjeniyê de ma. Lê bûyer li ser nîqaş û devjeniya serê sibê êvarekê bi êrîşa çekdarî bi dawî bû. Destûr nehat dayîn ku rojnameger bikevin nav gund. Rojnamevan 500 metreyan li dûrî gund hatine rawestandin.

Beriya ku cenaze bên defînkirin muameleyên otopsiyê yên 44 kesên hatine kuştin li morga nexweşxaneya Dewletê ya Mêrdînê hatin kirin.

**Hikûmet pişgiriya wan dike**

Gundê Çilkaniya girêdayî Şemrexê û mezraya wê Zankirt xwedî hin taybetiyên balkêş in. Ev gund ji mêj ve cerdevaniyê dikin. Bi hêza cerdevaniyê gundiyên ku nexwestin cerdevaniyê bikin ji gund der xistin. Lê piştî demekê cerdevanên gund xwe bi xwe dest bi şer û pevçûnan kirin. Gelek caran di navbera wan de şer qewimîn. Lê ligel vê jî çekên wan ji destên wan nehatin standin. Berovajî pişta wan ji aliyê rayedarên di pergalên dewlet û hikûmetê de cih digirin ve hate mistdan. Li gund di hilbijartinan de ji bilî AKP'ê tu deng ji partiyên din re derneket. Ev jî nîşan dide ku pergala fermî li herêmê kujeran xwedî dike û pişta wan mist dide.

**Dixwazin kurdan reş bikin**

Durûtiya hikûmetê di van bûyeran de jî bi dawî nabe. Ligel ku tevkujî ji aliyê cerdevanên hikûmetê ve hatiye kirin, hikûmet hewl dide ku bûyerê wekî kevneşopiya kurdan bide nîşandan û bi vê bûyerê kurdan di qada nav neteweyî de reş bike. Lê îstatîstîk vê derew derdixe. Bi îstatîstîkên dawî derket holê ku di du salên dawî de cerdevanan 61 kes kuştine û hikûmetê ev rastî aşkera nekir û biryar girt ku 10 hezar cerdevanên nû bigire.

Gundê mijara gotinê ji Şemrexê 40 kîlometre dûr e. Nifûsa wê 300 e. Ji van 4 jê zarok û 17 jê jin bi giştî 44 kes hatin kuştin. Hate ragihandin ku 8 kesên bi hinceta êrîş pêk anîne hatine binçavkirin û tên pirsyarkirin cerdevan bûne. Di vê navberê de hate hînbûn ku ji Saziya Tipa Edlî ya Edeneyê ji bo bigihîjin lêkolîna li morga Nexweşxaneya Dewletê ya Mêrdînê 3 bijîşk û 2 teknîsyen bi helîkomterê rêkirin herêmê. Li gundê lê hawar bilind dibin gor tên kolan. MÊRDÎN / DÎHA

## 'Ev zihniyet, zîhnîyeta barbaran e'

Dîsa, di demeke ku kurdan biryara rawestandina çalakiyan girtiye û siyaseta kurd di pêvajoyeke pir hesas re derbas dibe de pêkhatina bûyerên wiha tesadufî nîn in, nikarin tesadufî bin.

Çawa aşkera bû ku bûyerên wek qetliama li Şirnexê (Guçlukonak) û Gungorena Stenbolê karê dewleta kûr bû, wê zû yan dereng aşkera bibe ku ev jî bi fermana rayedarên dewleta kûr pêk hatiye.

Dema mirov yekser rojnameyên kurdî û tirkî vekir û nûçeyên der barê vê bûyerê de yek bi yek xwendin, hema hema hemû rojnameyan wek hev nivîsîbû, lê daxuyaniyeke balkêş hebû. Daxuyaniya "Wezîrê" Karên Hundir Beşîr Atalay bû ku digot: "Li gorî daneyên hatine bidestxistin hişmendiyeke xurt derket holê ku bûyera mijara gotinê ji ber êrîşeke 'terorê' nîn e." Yanî li gorî wezîrê tirk kuştina 45 mirovan bi carekê kareki teroristî nîn e, yanî kuştina Medîneya 3 salî û Rûkena 4 salî û kuştina mirovên bêguneh karekî teroristî nîn e û ew kesên ku ew kar kirine jî terorist nîn in. Wezîrek bi vî rengî bûyerê dinirxîne. Gelo ji mirov napirsin ka ew çi mantiq û zihniyet e? Çawa dibe ku kuştina serbazekî (eskerekî) di şer de teror e, lê qetliama jin û zarokan ne teror e? Gelo ev feraset di kengê bê guhertin? Gelo ev zihniyet bi xwe ne çavkaniya teror û terorîzmê ye?

## Girtina Atilimê hate protestokirin

Xebatkarên rojnameya Atilimê girtina rojnameya Atilimê protesto kirin û her wiha destnîşan kirin ku di 3'yê gulanê roja Azadiya Çapemeniya Cîhanê de ev biryar ji bo rojnameyê hatiye dayîn. Her wiha xebatkarên Atilimê da zanîn ku ev yek nêzîkatiya hikûmetê ji bo çapemeniyê derdixe holê û wiha berdewam kirin: "Dê tu tişt li hemberî rastiya Atilimê nebe asteng."

Xebatkarên rojnameya Atilimê bi armanca ku di 3'yê gulanê de mehek cezayê girtinê li rojnameya wan hatibû birîn, li qada Galatasarayê hatin cem hev û ev nêzîkatiya hikûmetê protesto kirin. Xebatkaran pankarta 'Rojnameya Atilimê di 3'yê gulanê roja Azadiya Çapemeniya Cîhanê de hate girtin, em ê bêdeng nemînin' vekirin û her wiha bênavber sloganên wekî 'çapemeniya sosyalîst nayê sekinandin', 'Atilim bêdeng nemaye û dê bêdeng nemîne' berz kirin. Xebatkarê rojnameyê Kadir Aktaş axivî û wiha got: "Em di roja Azadiya Çapemeniya Cîhanê de hatin sansurkirin. Rojnamegerên me gelek caran rastî sansurê hatin." STENBOL

## 2 sal in cenazeyê Karakuş nadin

Cenazeyê Seyîthan Karakuşê HPG'î ku 2 sal berê li çoltera navçeya Xozata Dêrsîmê di pevçûnekê de jiyana xwe jî dest dabû nadin malbata wî. Bavê Seyîthan Karakuş Cahît Karakuş ku li hemberî vê



yekê nerazîbûn nîşan da, anî ziman ku tevî teşhîsa cenaze hatiye kirin jî cenazeyê kurê wî nadin û diyar kir ku ji ber bûyerê mexdûr dibin.

Malbata Seyîthan Karakuş (Seyîthan Govî) ê HPG'î ku li navçeya Xavesor a Wanê ji dayik bûye û di 14'ê nîsana 2007'an de li çoltera navçeya Xozata Dêrsîmê di encama pevçûnekê de jiyana xwe ji dest daye, ev 2 sal in nikare cenazeyê kurê xwe bigire. Bavê Karakuş Cahît Karakuş, destnîşan kir ku dema kurê wî jiyana xwe ji dest daye, ji bo teşhîsê hatiye Xozatê û li morgê kurê xwe teşhîs kiriye. Cahît Karakuş, da zanîn ku tevî teşhîsê jî cenaze nadinê û daxuyand ku ji nû ve ji bo testa DNA'yê mînakên xwînê dixwazin. Cahît Karakuş, bi lêv kir ku dema ji bo teşîsê çûye morgê dîtiye cenazeyê kurê wî hatiye perçekirin û da zanîn ku dozger jê re gotiye 'Tu biçe mala xwe, tu ji dûr hatiyî, dema encama testa DNA'yê bê ez ê te agahdar bikim' û destnîşan kir ku li ser vê yekê vegeriyaye malê.

Karakuş, daxuyand ku piştî vegeriyaye Wanê, her tim pirsa encama testan ji Dozgeriya Xozatê kiriye û wiha dom kir: "5 meh derbas bûn, lê tu agahî ji bo me nehat. Min ji dozger re telefon vekir. Ji min re gotin 'Encamên testê li Meletiyê ne, biçe wir'. Lê ez nikaribûm biçim, hevsera min û zarokê min piştî salekê roja 14'ê nîsana 2008'an de çûn navçeya Xozatê. Dozger gotiyê encam hatine, lê testa DNA'yê li hev derneketiye. Lê tevî hevsera min û zarokên min jî cenaze teşîs kirin, cenaze nadin wan."

Karakuş, destnîşan kir ku herî dawî di 29'ê nîsana 2009'an de çûye cem dozgerê Xozatê û wiha got: "Min ji dozger re got ez jî weletiyê vî welatî me, ez dixwazim cenazeyê kurê xwe bigirim, lê dîsa jî destûr neda. Ji neçarî min gora kurê xwe li Xozatê çêkir. Em mexdûr kirin. Ji ber alîkariya Şaredarê Xozatê Cevdet Konak jî spasiyê xwe dikim." WAN / DÎHA

## Li Hezexê 2 kes hatin binçavkirin

ŞIRNEX

Li bajaroka Deşta Darê ya girêdayî navçeya Hezexa Şirnexê şevê din di encama serdagirtinên malan de kesên bi navên Ahmet İmecîk û Îbrahîm Akman ji aliyê leşkerên girêdayî Qereqola Cendirmeyan a Hezexê ve hatin binçavkirin.

## Di teqîna Bedlîsê de çawîşekî pispor mir

BEDLÎS

Di encama teqîna li Çiyayên Sihiyê ya di navbera navçeyên Hizan û Tetwanê yên Bedlîsê de di dema operasyon pêk hat de çawîşekî pispor jiyana xwe ji dest da. Li gorî agahiyan, li herêma Çiyayên Sihiyê ya di navbera navçeyên Hizan û Tetwanê yên Bedlîsê de, li herêma operasyonê di dema derbasbûna leşkeran de teqîn pêk hat. Hate ragihandin ku di encama teqînê de çawîşê pispor ê bi navê Aygun Bulut jiyana xwe ji dest da.

## Li çoltera Licê operasyon

AMED

Li gorî agahiyên ku hatin bidestxistin li çoltera Licê ya Amedê artêşa tirk dest bi operasyoneke leşkerî ya berfireh kir. Operasyon li gundên Huseynik (Arikli), Dêrxûst (Dibek) û Cinêzûrê didome. Di operasyonê de ligel wesayîtên leşkerî, ji ber tirsa bombe ango mayînên ji dûr ve tên teqandin wesayîtên Jammer ku sinyalan tevlîhev dikin sewqî herêma operasyonê hatin kirin. Çûn û hatina gundiyên herêmê di bin kontrola leşekeran de pêk tê. Heta rojnameya me ket weşanê jî tu şerek neqewimîbû.

## Ji nîşana serkeftinê re 6 sal û 3 meh ceza

Xwendekarê Zanîngeha Dîcleyê Murat Işikirik, bi hinceta di 28'ê adara 2006'an de li Amedê tevî merasîma cenazeyê HPG'iyan bûye, nîşana serkeftinê kiriye û tevî daxuyaniyê bûye bi giştî 7 sal û 11 meh cezayê girtîgehê lê hate birîn. Li ser daxwaza Dadgeha Bilind ku ji vî cezayî 6 sal û 3 meh erê kir dadgeha herêmî derheqê Işikirik de 2 carên din 10 meh cezayê girtîgehê da. Serdozgeriya Dadgeha Bilind, anî ziman ku ji bo Işikirik bi îdiaya "Tevî ne endamê rêxistinê ye li ser navê rêxistinê sûc kiriye" bê cezakirin di dosyayê de delîl tune ye. Parêzer Bariş Buyuk jî anî ziman ku piştî bûyerên 28'ê adarê welatî bi şeklekî tomarî tên cezakirin û destnîşan kir ku ev yek ne hiqûqî ye.

Xwendekarê Beşa Felsefeyê ya Zanîngeha Dîcleyê Murat Işikirik, bi îdiaya ku tevî merasîma cenazeyê 14 HPG'iyên di 28'ê adara 2006'an de li çoltera Şenyaylaya di navbera navçeya Pasûra Amedê û Mûşê de jiyana xwe ji dest dan û li Amedê hatin defîkirin bûye û di 5'ê gulana 2007'an de jî tevî daxuyaniya li Kampusa Zangîngeha Dîcleyê hatiye dayîn bûye di 10'ê adara sala 2007'an de hate binçavkirin. Der heqê Işikirik ku ji aliyê dadgehê ve hate girtin de bi sûcdariya "Tevî ne endamê rêxistinê ye li ser navê rêxistinê sûc kiriye" û "Propagandaya rêxistinê kiriye" li 5'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê doz hate vekirin. Dozgerê Komarê, xwest Işikirik ji ber 2 çalakiyên cuda were cezakirin. Işikirik, diyar kir ku tevî bûyerên 28'ê adarê nebûye û anî ziman ku tevî daxuyaniya li Zanîngeha Dîcleyê hatiye dayîn bûye. Işikirik, destnîşan kiribû ku ji bo cîhaneke şer lê nebe tevî daxuyaniyê bûye û dabû zanîn ku tu têkiliya wî bi rêxistinê re tune ye. AMED

# Emîne Ayna: Tevkujiya Şemrexê encama polîtîkayên dewletê ye

**Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna di civîna koma partiya xwe de bûyera Şemrexê nirxand û pirs kir ku gelo, cerdevanan di tevkujiyê de çekên dewletê bi kar anîne an na?**



Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna ku di civîna koma partiya xwe de êrîşa li Mêrdînê şermezar kir, anî ziman komkujî asta ku cerdevanî gihiştiyê nîşan dide û pirsa gelo çekên di komkujiyê de hatine bikaranîn aydî dewletê ne an na?, kir. Ayna, da zanîn êrîşên li hemberî DTP'ê hîn didomin û wiha got: "Bi girtina riya siyasetê, riya çiyê nîşanî me didin. Eger êrîş dom bikin em ê berxwedana giştî bikin. Gelê me paşde gavê naavêje."

Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna ku di civîna koma partiya xwe de axivî, pêşketinên di rojevê de nirxandin. Ayna di destpêka axaftina xwe de tevkujiya li Şemrexa Mêrdînê şermezar kir, wiha got: "Li gorî agahiyên gihîştine destê me, bûyer di navbera eşîrek ku dewletê çek daye wan û ew kirine cerdevan de pêş ketiye." Ayna, anî ziman ku bûyer dijwar û bi xof e û wiha dom kir: "Bûyer, asta ku pergala cerdevaniyê ya vergeriyaye şebekeya cinayetan a dewletê ya li ser mirin û kuştinê hatiye avakirin nîşan dide. Bûyera li Mêrdînê her çend wekî pevçûnek di nava malbatê de were nîşandan jî, encama polîtîkaya ji aliyê dewletê ve tê meşandin a kurdan li hemberî kurdan derdixe ye."

**'Berpirsiyar dewlet e'**

Ayna, anî ziman ku ev bûyer careke din bangên DTP'ê yên ji bo rakirina pergala cerdevaniyê mafdar derdixe û diyar kir ku pergala hatiye avakirin talûke ye. Ayna, wiha dom kir: "Komkujiya pêk hatiye, nîşan dide ku cerdevanên çeka dewletê girtine destê xwe, hêza dewletê li cem xwe dibînin dikarin bi hovîtî malbata xwe jî qetil bikin. Ev bûyer nîşan dide ku ev hêzên han dikarin hin tiştên din jî pêk bînin." Ayna, bilêv kir ku cerdevanên heta niha tevî gelek sûcên wekî cinayetên kiryarên wan nediyar, tecawiz, revandin, bazirganiya tiryakê bûne, di bin navê "Li hemberî PKK'ê şer dikin" de ji aliyê dewletê ve tên parastin û anî ziman ku cerdevanan bi hêza ji dewletê digirin komkujiya duh pêk aniye. Ayna, bi bîr xist ku kesên hatine binçavkirin 9 in û wiha dom kir: "Û divê dewlet bi lez vê yekê aşkere bike. Gelo ew çekên di kuştina wan kesan de hatin bikaranîn aydî dewletê ne?"

**Astengkirina siyaseta kurd...**

Ayna ku ji ber tevkujiya pêk hatiye banga xwe ya "Cerdevaniyê bi dawî bikin" dubare kir, wiha got: "Ji HEP'ê heta niha li qadên siyaseta kurd tê meşandin feodalîte hatiye paşxistin. Bi siyaseta ji aliyê me ve tê meşandin hişmendiya eşîrî, xwîndarî, revandin, zewaca bi darê zorê, berdêl û têkiliyên feodal êdî şerm tên dîtin. Lê çi heyf e ku nêzîkatiya siyaseta demokratîk a DTP'ê bi destê dewletê tê astengkirin. Li cihên ku pergala cerdevaniyê bi darê zorê hatiye pêşxistin, bi destê dewletê têkiliyên paşverû û feodalîte bi taybetî tê parastin." Ayna, destnîşan kir ku komkujî encama nêzîkatiya mijara gotinê ye û bang kir ku pergala cerdevaniyê bê rakirin.

**'Em ê têkoşîna Denîzan bidomînin'**

Ayan ku di axaftina xwe de Denîz Gezmîş, Huseyîn Înan û Yusuf Asalan ên 37 sal berê di 6'ê Gulana 1972'yan de hatin bidarvekirin bi bîr anîn, anî ziman ku Denîzan li dijî emperyalîzm û dagirkeriyê ji bo azadiya gelê Tirkiyeyê têkoşîn dane. Ayna, wiha got: "Ji bo hemû mirovan, bi heyecaneke azadiyê heta dawî têkoşîn dan. Em dê îro, di têkoşîna azadî, aştî û demokrasiyê ya welatê xwe de, di pêş de ala ku me ji Denîzan girtiye bi biryareke mezin rakin."

Ayna, diyar kir ku zîhniyeta di 1972'yan de Denîz Gezmîş darve kir îro jî hebûna xwe didomîne û anî ziman ku pêkutî li ser DTP'ê didomin. Ayna, wiha derbirî: "Li hemberî şer em çareseriya demokratîk derdixin holê. Lê ne riya siyasetê riya çiyê nîşanî me didin. Ji ber ku tenê DTP diyar dike ku dê pirsgirêka kurd bi şer û şîdetê çareser nebe, dibe hedef." Ayna ku bîlançoya operasyona li hemberî partiya xwe jî da, diyar kir ku li Amedê 51, li Mêrdînê 20, li Semsûrê 18, li Aydînê 5, li Kocaeliyê 6, li Enqereyê 2, li Îzmîrê 10, li Stenbolê 7, li Êlihê 13, li Mêrsînê 1, li Bedlîsê 30, li Agiriyê 23, li Erdexanê 3, li Îdirê 12, li Şirnexê 20, li Wanê 1 bi giştî 222 DTP'yî hatine girtin. Ayna ku pirsên "Gelo operasyonên li tevahiya Tirkiyeyê tên meşandin ne derbeye çiye? Gelo li ku derê cîhanê hatiye dîtin li hemberî partiyeke siyasî operasyoneke wiha berfireh hatiye meşandin?" kirin, anî ziman ku girtinên pêk hatine ne hiqûqî ne.

**'Tişta xelet helwest û siyaseta we ye'**

Ayna, derbirî ku operasyona li dijî DTP'ê bi armanca berovajîkirina rojevê hatiye lidarxistin û anî ziman ku hemû rayedar DTP'ê hedef nîşan didin. Ayna, li hemberî gotinên Serokomar Gul ên "Lazim e ew wekî siyasetmendarên normal nêzîk bibin", wiha bersiv da: "Ya normal çiye? Eger em bibin tevkarê nêrîna we ya şaş a têkildarî dîrokê û bibin aletê wê dê rast be? Gelo ya normal înkara nasnameya gelekî û pelçiqandina çanda wî ye? Gelo fesadiya şer û kuştina ciwanan ya normal e? Israra ji bo polîtîkayên neçariyê normal e? Birêz Serokomar ya ne normal polîtîkaya we û ya ev 30 sal in tê meşandin e."

Ayna, wiha got: "DTP'î ji bo sekna xwe ya sivîl hedef tên girtin. Sekna DTP'ê ya sivîl apoletên wan deşîfre dike. Sedema nerazîbûnê ev e. Hatina Serfermandarê Giştî ya Meclîsê ku bi saya DTP'ê pêk hat gaveke baş e. Em dixwazin ji Serfermandar bipirsin. Hûn dibêjin em bi DTP'ê re di bin heman banî de namînin, wê demê hûn dê çi bikin ji milyonan kesên dilsozên partiya me û deng dane? Wiha tê dîtin û fêmkirin ku; ya hedef tê nîşandan ne tenê partiya me ye. Gelê me jî bi awayekî aşkere bûye hedefa êrîşa giştî. Li hemberî êrîşên giştî em dê berxwedana giştî pêş bixin." **ENQERE / DÎHA**



## Denîz, Yusuf, Huseyîn ji bîr nabin

37'emîn salvegera bidarvekirina damezrîner û rêveberê Artêşa Rizgariya Gelê Tirkiyeyê (THKO) Denîz Gezmîş, Yusuf Aslan û Huseyin Înan dê bi çalakiyên cur bi cur were bibîranîn. 78'î ji bo girêdayîna xwe ya bi Denîz Gezmîş û hevalên wî re îfade bikin, dan zanîn dê bername bi şiklê mitîngê derbas bibe.

Ji rêberên tevgera ciwanan a piştî 1965'an li Tirkiyeyê pêş ket, damezrîner û rêveberên THKO'yê Denîz Gezmîş, Yusuf Aslan û Huseyîn Înan, di 6'ê gulana sala 1972'yan de li Girtîgeha Sîvîl a Cebecî ya Enqereyê hatin bidarvekirin. 37'emîn salvegera darvekirina Gezmîş û hevalên wî dê li goristana Karşiyaka ya Enqereyê bên bibîranîn. Bîranîna ku bi pêşengiya rêxistinên sivîl ên civakî yên Enqereyê bê pêkanîn, dê di 6'ê gulanê (îro) de saet di 12.30'an de li deriyê Nimreya 2 yê Goristana Karşiyakayê pêk bê. Di bîranînê de dê hevalê Gezmîş Mustafa Yalçiner û parêzerê wî Halît Çelenk biaxivin. Serokê Federasyona 78'an ya Enqereyê Ruşen Sumbuloglu, diyar kir ku dê birînanîn wekî mitîngê derbas bibe û daxuyand ku dê li mirovatiya Denîzan û ruhê têkoşîna wan xwedî derkevin. Serokê Komeleya Piştgirî û Yekîtiya 78'an a Enqereyê Huseyîn Gevher jî, anî ziman ku dê Gezmîş û hevalên wî bi şiklekî maf dikin bi bîr bînin. Gevher, wiha dom kir: "Dil dixwest ku ne tenê li Enqereyê, li hemû deverên Tirkiyeyê ev bibîranîn pêk bê. Ji bo tevgera şoreşger a Tirkiyeyê rewşa xwe ya bêhêz derbas bike em wateyeke mezin didin vê bibîranînê." **ENQERE / DÎHA**

## Şaredariyê bi çandina şitlan dest bi xebatê kir

Şaredarê Norşîna Bedlîsê yê DTP'î M.Emîn Ozkan ku di hilbijartinên herêmî ya 29'ê adarê de hate hilbijartin, bi çandina şitlan dest bi xebatên şaredariyê kir.

Şaredarê Norşînê M.Emîn Ozkan, bi çandina şitlan dest bi xebatên xwe kir. Ozkan, diyar kir ku di xebatên çandina şitlan de hin caran welatî jî dibin alîkar û anî ziman ku ji ber vê yekê gelekî kêfxweş dibin. Ozkan, diyar kir ku ku ew dê li dora riya navenda navçeyê her ji 10 metreyî yan şitlekê bi tevahî 500 şitlan biçînin. Ozkan, anî ziman ku ji bo şitil zirarê nebînin heta mezin bibin dê dora şitlan bigirin. Ozkan, wiha got: "Me ev xebata bi derfetên şaredariyê da destpêkirin. Di rojên pêş de em dê vê xebatê li hemû deverên navçeyê bidomînin." **BEDLÎS**

## Li Muglayê ciwan ji bo piştgiriya DTP'ê rûniştin

Ciwanên Welatparêz û Demokratîk (YDG-M) bi armanca piştgiriya çalakiya greva birçîbûnê ku ji bo şermezarkirina operasyona li hemberî DTP'ê li Amedê bi tevlêbûna Hevserokên DTP'ê, parlamenterên DTP'ê û şaredarên DTP'î hate pêkanîn çalakiya rûniştinê li dar xistin.

Ciwanên YDG-M'î bi armanca piştgiriyê di saetên êvarê de li Qada Sinirsiz a Muglayê 4 saetan çalakiya rûniştinê li dar xistin. Ciwanan di çalakiyê de pankarta "Pêkutî me bêzar nakin" vekirin û dowîzên "Ciwan hêzên parastina DTP'ê ne", "Em ê bi berxwedanê dest bixin", "Bi înyat aştî û bi înyat aştî", "Azadî, biratî" rakirin. Emîne Duz ku li ser navê komê daxuyanî da, diyar kir ku çalakiya DTP'ê ya dîrokî, silav dikin. Duz, diyar kir ku bi armanca ji Muglayê dengê xwe bigihînin Amedê çalakiya rûniştinê pêk aniye . **MUGLA**

## Qerejdaxê jî bû herêma qedexe

**ENQERE**

Di nota agahdariyê ya ji aliyê Serfermandariya Giştî ve di malpera înternetê de hate dayîn de, koordînatên têkildarî herêma ku dê di navbera 8-16'ê gulanê û 24-29'ê gulanê de ketin û derketina wê bê qedexekirin cih digirin. Serfermandariya Giştî duh li Dêrsimê 5 herêmên cuda di navbera, 7'ê gulan û 7'ê tebaxê de wekî herêma ewlekariya leşkerî îlan kir. Di nava herêmên ku heta demekê wekî 'herêmên ewlekariyê' hatin îlankirin de Alîbogazi, Ahpanos Vadîlerî, navçeyên Xazan, Pilûr, Çemîşkezek ên Dêrsimê cih digirin. Serfermandariya Giştî îro jî di malpera xwe ya înternetê de diyar kir ku herêma Qerejdaxê ya li Navçeya Sêwrekê ya Rihayê jî ji bo demekê wekî herêma ewlekariyê îlan kiriye.

## Di fuara turîzmê de Wan tê nasandin

**WAN**

Midûrê Çand û Turîzm ê Bajarê Wanê Doç. Dr. Zekî Taştan, diyar kir ku di 2'êmîn Fuara Turîzm a Batumî Ekspo ya 2009'an de ku wê di navbara 8-10'ê gulanê de li Gurcîstanê pêk bê dê bajarê Wanê bidin nasandin. Ji aliyê Midûriyeta Çand û Turîzm a Bajarê Wanê ve têkildarî 2'yemîn Fuara Turîzmê ya Navneteweyî ya 2009'an civîna çapemeniyê hate lidarxistin. Taştan anî ziman ku Paceyên Periyan ên li Elbakê ku di çapemeniya herêmî de derketine deng daye û anî ziman ku dê xebatên wiha bidomînin. Taştan, destnîşan kir ku di 2'êmîn Fuara Turîzm a Navneteweyî ya dê di navbera 8-10'ê gulanê de li Gurcîstanê pêk were de wekî Walîtiya Wanê û Midûriyeta Çand û Turizm dê bajarê Wanê bidin nasandin. Taştan, anî ziman ku ji ber dê welatên cînar û welatên nêzî Gurcîstanê jî beşdarî vê fuara li bajarê Batumê bibin, dê danasîna bajarê Wanê gelek girîng be. Taştan, derbirî ku ji Tirkiye tenê dê Wan beşdarî vê fuarê bibin û wiha got: "Ev ji bo me gavek girîng e û birûmet e."

# Têkiliya mekan û wêjeyê



İrfan AMÎDA

Mekan çawa bi hebûn/bûneweriya mirov ve girêdayî be, ya jî yek ji hîmên bingehîn ya xwehîskirina mirov be, ji ber ku wêje jî tevgereke mirovî ye, vegotina jiyana mirov e û di her merhaleyê de mirov ya jî tişta bi mirov ve girêdayî heye, rasterast têkiliya wêje û mekan jî heye. Çawa bêyî mekan mirov nikaribe hebûna xwe bi temamî destnîşan bike, nikaribe xwe vebêje, di heman demê de nikare wêjeyê ji biafirîne ya jî bi temamî vebêje.

Ev mekan, razber ya jî şênber, ji devereke biçûk, ji tiliya mirov, çavên mirov, dilê mirov heta bajarekî, welatekî, dinya û gerdûnê fireh dibe û tête guhertin. Ya jî a rast bi sînorê xeyalên mirov ve girêdayî û li gora têgihînê tête guhertin. Mercên seretayî, dîsa razber ya jî şênber, pelandin û sînor in. Ev yek, li gel wêje/wêjevan, ji bo têkiliyek di navbera xwendevan û wêjeyê de bê ava kirin jî hewceye, ya jî di têkiliya navbera xwendevan û wêjeyê de jî heye.

Piranî di roman û çîrokê de wêje, ji bo ku xwendevan di nava wêjeyê keve û bikaribe di nava wê de dest bi rêwîtiyekê bike, pêdivî bi mekan dibîne. Beriya her tiştî ev mekan wekî dekor tê bikaranîn û bisînor dike. Ev ji bo fêmkirinê jî hewce ye. Heger mirov bandora mekan ya li ser bûyer, encam û kesayetî/çanda kesan bipejirîne, ji bo ku qerekter bi xwe jî, mijar/bûyer jî bêne fêmkirin, pêdiviya wêjevan/wêjeyê bi mekan heye.

Wekî ku me got; beriya her tiştî mekan wekî dekor tê bikaranîn. Di heman demê de şanîdêr e. Ji ber ku şanîdêr e,  Mekan biarmanc e û alaveke watedar e di wêjeyê de. Wate û felsefeya metna wêjeyê temam dike. Ji loma jî di wêjeyê de mekan li gorî wateyê divê bê afirandin. Mekanê ku dê di wêjeyê de bê bikar anîn divê bê naskirin. Tenê ne ji hêla xwe ya fizîkî ve divê bi giştî qerektera mekan bê zanîn, bandora wê ya li ser mirovan jî bête zanîn.

Ji derveyî vê yekê jî mekan di qerektera wêjevanan de jî cihekî girîng girtiye. Wêjevan parîkî dişibin welatê xwe, bajarên xwe ango mekanên xwe. Gelek wêjevan bi welatên xwe têne naskirin, bêyî welatên xwe nayên nirxandin. Wekî gelek nivîskaran, têkiliya Baudlere û Parîs mînakeke gelekî balkêş e di vê mijarê de. Ne Parîs bêyî Baudlere Parîs e ne jî Baudlere bêyî Parîs'ê Baudlere… him aciziya, elem û kedera wî ye Parîs him jî şahî, coşî û serfiraziya wî… bi kurtasî hebûna Baudlere e Parîs. Ya jî têkiliya Bêrûdê û nivîskarên wê, ya Filîstîn û wêjevanên wê…

Goethe dibêje; ji bo ku mirov helbestkar/nivîskar nas bike divê here welatê nivîskar…, û bi awayî bandora mekan ya li ser wêjevan destnîşan dike. Bi êrênî û neyênî wêjevan perçeyeke welatê xwe, bajarê xwe ye. Di vê çarçovêyê de mirov dikare bibêje ku wêjevan encama welatê xwe ye ango mekanê xwe ye û têgihînên wêjevan, zimanê wêjevan jî li gorî mekanê wêjevan dirûv digire. Ligel wêjevan, qerekterên/lehengên di behremê de jî bi mekan ve girêdayîne û hêla wêjevan û xwendevanan ve di vê pêywendiyê de jî bête nirxandin. Heger ne erênî ne jî neyênî têkiliya leheng û mekan bi hev re tunebe berhema wêjeyî jig elek hêlan ve qels dimîne.

Helbet berhemên bê mekan û bê zeman jî hene û mekan di dîroka wêjeyê de hatiye nîqaş kirin. Lê ev bi xwe felsefeyek e. Nerîneke li mekan e. Helwesteke rexneyî ya di çarçoveya têkiliya mirov û mekan de ye ku qonaxeke ji realîya mekan derbasî surrealiya mekan bûyînê ye. serrastî yê. Bêmekanî ya di wêjeyê de ji rexneya mekan tê ji loma jî. Heger wêje û wêjevan têra xwe têkilî bi mekan re dananî be wê negihîştibe rastiya mekan û wê ji wê rastiyê derbasî serrastiya mekan jî nebe. Ev yek piranî di jiyana wêjevanên ku welatên wan/mekanên wan, ji hêla fizîkî, sosyolojîk û siyasî ve, bi pirsgirêkin de xwe hinekî din derdixe pêş.



# Hevrê Can

Hevrê Can
em ji hev têr nebûn
em ji bêhna kulîlkên çolê
bayê zozanan têr nebûn…
ez ji dengê te têr nebûm
Hevrê Can
dengê te yê bi baranî…

dengê te dibû rûbarekî nazdar
dara miradê av dida
carinan jî dibû destmala guliyên li darê
bi bayê re dihejiya
destmala miradê
destmala rihê lorîkan…

lorî lorî Hevrê Can
êdî ji te dûr e jana
miradan…

dengê te şevên min ên bê tava hîv de
qevdê stêrkan kom dikirin ji bo min
stêrkên xerîb û bêwar

dengê te dibû pêlên sewqê
dihat ser emrê min ê bê tebat
lorî lorî Hevrê Can
êdî ji te dûr e xewna
biharan…
Hevrê Can!

dengê te straneki aramî bû
geliyê dilê min de
straneki tenê û xem
revandî
mîna vê welatê
stran dibû çîrok
çîroka siwarê efsûnî
ka dibêjin ya;
carekî ji cara hebû tune bû"
tu hebû ez tune bûm
ez hebûm tu tune bû
tu tune bû Hevrê Can!
lorî lorî Hevrê Can
êdî ji te dûr e êşa hesretan

**ROJBÎN PERÎŞAN**



dilges_dilges@hotmail.com
Dr. DILGEŞ

# Roviyên me şamiyan naxwin

Gelî camêr û canjinan; van rojan hem ji ber guherîna demsalê hem jî ji ber rûdan û aloziyan her kes di qoşxana xwe de dikele û rik û hêrs, stres û bêhntengî li bin guhê hev dikeve…

Vêca, di heyameke wisa de, tiştê herî zor û zehmet ew e ku mirov bikaribe piçek be jî keniya mirovan bîne û piçekî kurîşkên li eniya wan belav bike û bihêle ku ligel her tiştî bi çavekî pozîtîf, xweşbîn û geşbîn (zêde nekevin ber bayê polyanayê û xwe nexapînin ha) berê xwe bidine jiyanê.

Ez, di vê heyama ku 'konsept' wekî gîskê gurî dibe hinbama ber tîrên her kesê, bêyî ku xwe berdim ber ava rojevê û pê re biçim xwarê; dixwazim, li hin frekansên keniyê hingivêm.

Ji ber ku piraniya me kurdan 'beran' in, serê me li tu dîzikan hilnayên û gelek caran hevrikî û berberiya nava me ji derve ve dîmeneke trajî-pêkenîk tîne pê.

Îro ez ê serhatiya du jinên kurd bi we re parve bikim. Yek ji Colemêrgê ye, ya dî ji Farqînê.

Her du jî ji bilî kurdî bi tu zimanî nizanin. Kerem kin li sohbeta wan guhdarî bikin.

Ya Colemêrgî: Xwîşkê, li gundan, em bi çandiniyê derbara xwe dikin

Ya Farqînî: Erê xwehê, em jî hem rezvaniyê dikin hem jî sewalan xwedî dikin

Ya Colemêrgî: Me jî mirîşk hene, belê ji ber kûje û roviyan çi hewiyara wan nîn e

Ya Farqînî di dilê xwe de dihizre, (Kûje û mirîşk çi ne, qey behsa tûtik û şamiyan dike) û dibêje: Wîî! Wele, me jî şamî hene, belê rovî şamiyên me dixwe.

Ya Colemêrgî pir diheyire, di dilê xwe de dibêje, (Heyran, rovî çawa şamiyan dixwe. Colemêrgî ji garis û gilgil re dibêjin şamî) û lê vedigerîne: Wîî xwîşkê, wele, roviyên me şamiyan naxwin lê berazan talana şamiyên me înaye.

Ya Farqînî li hemberî vê gotinê diremite û devê wê deh gezan dimîne vekirî û difikire, (Wey li minê, beraz çi ye vêca; heke ji wehş re bêje, ka ew çawa şamiyan dixwe) û piştre ji axaftina xwe diguherin…

Gelî dost û haziran; wisa xuya ye, hêj ev girar dê gelek bikele.  Yanî, mesela me kurdan û tirkan jî wisa ye; ne wekî em dibêjin, wekî ew dixwazin fêm bikin me 'fêm' dikin.

Nimûneya herî berbiçav di civîn(darbe)a agahdarkirina çapemeniyê ya serokerkaniyê de xwe da der: Camêr got, ji bo zarokên 12 û 18 salî diviya projeyên me yên liberdilîşirînkirinê hebin. Ji bo wê jî di tvyan de giranî dane ser bernameyên 'stêrkirina' zarokan. Para me kurdan jî, 'stêrkirina' Seyfî û yên din e.

Yanî, ew şamiyan (bila farqînî biborin) bi roviyan didin xwarin.


Têm çavên we:))

HAWARA EYSO

SEBRA REMO NEMAYE




WERIN BI HAWARA MIN DE




RAZEMENIYA AKP'Ê




RÛYÊ NÛ YÊ DYA'YÊ



## Qerf û Henek

### Baylozê Çaçan û gundiyekî gunehkar

Baylozê Çaçan gava dadxwazê (prokûror, sawcî) yê navçeyekê bû, wextê dadkirinê ji gundiyekî kurd dipirse: "Te çima ew pez dizîn?". Gundî lê vedigerîne, dibê min nedizîne, min ew li erdê dîtine. Dadxwaz şaş dimîne û pê re hêrs dikeve, ku çawa dibe merî kerî pez li erdê bibîne. Gundî lê vedigerîne, dibêjê: "Maqûlo, tu jî carna hinek pere ji erdê dibînî!". (Bi fikra, ku tu jî carna bertîlê dixwî).

www.arsivakurdi.org

# 'Muzîka li Başûr ji ya berê serkeftîtir nîn e'



**Hunermend Siyamend Oskullî got ku li rojavayê Kurdistanê muzîk û strana kurdî hinekî pêşketî û nû ye. Her wiha Oskullî, diyar kir ku li başûrê Kurdistanê hunermendên nû ji yên berê serkeftîtir nîn in**

■ **Imer KALO** / KOBANÎ

Hunermendê kurd Siyamend Oskullî got ku ger muzîk di jiyana mirovan de tunebûya, wê jiyan gelekî sar û hişk û ziwa bûya. Oskullî, diyar kir ku li herêma Kobaniyê muzîk destpêkê weke destanên dîrokî û bê rîtim dest pê kiriye.

Hunermend Siyamend Oskullî ji bajarê Kobanî rojavayê Kurdistanê ye. Oskulî heta niha du albûmên bi navê "Dîlbera min" û "Cara dawiyê" derxistiye. Oskulî der barê muzîka li rojavayê Kurdistanê û seranserî li Kurdistanê tê kirin de wiha dibêje: "Mirov dikare bêje ku muzîk û strana kurdî li rojavayê Kurdistanê hinekî pêşketî û nû ye, tevî ku stêr û navdarên wê kêm in jî, lê yên ku heyî bi hêz in û jêhatî ne wek Ciwan Haco û Ehmedê Çep û Miço Kendeş û Şeyda û Bangîn ... hwd. Û li bakurê Kurdistanê jî hin dengên bedew û hêz in hene wek Şivan Perwer û Nîzamedîn Ariç û hinên din... Lê li başûrê Kurdistanê yên kevin ji wan pir serkeftî bûn, hema nifşê wan ê nû hemû nêzîkî hev in. Û rojhilatê Kurdistanê jî di bin bandora muzîka farisî de ne, wek koma Kamkaran û Ezîz Çaroxî... hwd."

**Li Kobaniyê rewşa muzîkê**

Oskullî, diyar kir ku li herêma Kobaniyê muzîk destpêkê wek destanên dîrokî û bê ritim dest pê kiriye û axaftina xwe wiha direj kir: "Piştre hunermend Mihemed Xelîl Xazî (Mihemedê Dûman) dest pê kir û stran bi rengekî rast û durist ji awaz û gotin û saz û rîtiman damezirand. Di piştre hunermendê mezin Reşîd Sofî kasêtek bi deng û awazên xwe tomar kir, bi rengekî cuda di wê berhemê de xebitî bû, rengekî balkêş bû di strana kurdî de, her wiha hunermend Reşîd xwe kire mamostayekî ji hemû nifşên piştî xwe re di warê hînbûn û şopandina muzîkê bi rengekî zanistî li herêma Kobaniyê."

**'Ez jî dibim qedexe'**

Oskullî, der barê astengiyên li pêşiya xwe wiha got: "Ez gelek astengî û probleman ji aliyê êlitiyê û desthilatê de dibînim, bi sedema stran û dengbêjiya min gelek caran ez ji aliyê hêzên ewlekariyê ve hatime girtin. Tenê ji ber ku ez bi zimanê kurdî distrêm, ev jî li welatê me qedexe ye û ez jî wisa dibime qedexe." Oskullî, li ser sedemê ku di muzîka xwe de gelek awaz, rîtm, reng û şêweyên muzîkê yên cuda cuda bi kar tîne wiha got: "Ji ber ku reng û şêweyên cuda cuda û yên nû ji muzîka kurdî re pêdivî ne. Wek mînak di muzîka tirkî de gelek reng hene; erebesk û muzîka gelêrî, pop, muzîka hunerî hwd. Her wiha di muzîka Rojava de wek: Caz muzîk û Rock û Opera, ji ber vê baweriyê ez ji hin rengên ji hev cuda distirêm."

**Muzîk ruhê mirov e**

Oskullî, li ser rola hunermend got ku beriya her tiştî hezkirina wî ji welatê wî re û rêzgirtin ji miletê xwe re û pêşkêşkirina hemû tiştê ku ji dest tê di ber miletê xwe de, ji ber ku huner û hunermend jî wek neynikekê ne ji êş û derd û kulên milet û welatên xwe re ne. Her wiha Oskullî, da zanîn ku ger ku muzîk di jiyana mirovan de tunnebûya, wê jiyan gelekî sar û hişk û ziwa bûya, bi muzîkê re giyanê mirov dijî û têr dibe!

## Ji Enstîtuya Kurdî ya Amedê pirtûkeke hêja

Enstîtuya Kurdî ya Amedê ji bo qada zanistî ya kurdî berhemeke hêja weşand. Pirtûka Hesen Guneylî 'Matematîk' cihê xwe di nava refên pirtûkxaneya kurdî de girt.

Pirtûka 'Matematîk'ê ya Hesen GUNEYLÎ di encama xebateke demdirêj de hatiye afirandin. Di vê berhemê de hinek xalên sereke yên Matematîkê bi kurdî hatine ravekirin. Ev destpêkeke hînbûna matematîkê ya bi kurdî ye. Hinek mijarên sereke û têgihên matematîkî di berhemê de cih digirin. Ji ber ku destpêk e mijar bi berfirehî û kitekit negirtiye dest. Lê em bawer in ji bo pêşketina lîteratura matematîkê di kurdî de dê roleke girîng bilîze. Hinek mijarên sereke yên ku di vê berhemê de cih negirtine jî dê di çapa duyem an jî cilda duyem de cih bigirin.

**Nîqaşa têgihên matematîkê**

Di dawiya pirtûkê de ferhenga kurdî-tirkî-îngilîzî ya têgihên ku hatine bikaranîn cih digire. Di navlêkirinan de bi piranî ji ferheng û berhemên heyî sûd hatiye wergirtin. Ji bo nîqaşên li ser vê mijarê zêde bibin di pêşeka pirtûkê de wiha hatiye gotin: "Kesên ku ji bo van navlêkirinan xwediyê ramanên cuda bin ku nêrînên xwe bi me û nivîskar re par ve bikin em ê kêfxweş bibin. Hûn dikarin ji malpera bi navê www.matematikakurdi.com û Enstîtuya Kurdî ya Amedê re van dîtinên xwe ragihînin. Ev berhem ji bo me di heman demê de destpêka pêvajoya nîqaşa têgihên matematîkî ye jî." **AMED**




## Li Amedê weşanxaneyek nû *'AVA'*

Li nav weşanxaneyên kurdî weşanxaneyeke din zêde bû. Weşanxaneya AVA ku navenda wê li Amedê ye dê giraniyê bide ser werger û folklorê.

Li Amedê weşanxaneyeke bi navê AVA ava bû. Weşanxaneya AVA dixwaze deriyeke din li hunera peyvan veke. Xwedî û edîtorê weşanxaneyê nivîskar Ronî War e. Ronî War li ser armanca weşanxaneyê wiha dibêje, "Em dixwazin deriyekî din li hunera peyvê bikin." Ronî War dibêje, ew ê her cure pirtûkan çap bikin lê ew ê giraniyê bidin ser werger û folklorê. Kesên bixwazin bi weşanxaneyê re têkiliyê deynin dikarin di ser van navnîşanan weşanava@hotmail.com, avayayinlari@hotmail.com xwe bigihînin weşanxaneyê. **AMED**




## Li Swîsreyê civîna hevkariya çandî

12 saziyên ku li Swîsreyê xebatê dimeşînin li Komeleya Çanda Kurd û Hevkariyê li bajarê Chur li hev civiyan. Komcivîn bi mebesta hevkariya di warê çandî de hate lidarxistin.

Saziyên ku xebatên têkildarî biyaniyan xebatê dimeşînin yên mîna Nûnerên Rêxistina Mafê Mirovan-Caritas, RotesKruez (Xaçasor) a bajarê Chur, Internationaller Frauen Treff (Hevdîtina Jinan a Navneteweyî), Fluchtlinger Tag Verein (Komeleya Piştgiriya bi Penaberan re), Balikaton (Komeleya Filîpîniyan) Kraotische Gemeinsam (Yekitiya Hirvatan), Vossa Lingau, Fachstelle mit Evangelische (Dêra Ortodoks), St.Catherina-Klosters schule ( Dibistana St.Catherina-Klosters), Elternschule (Dibistana malbatan), Rojnameya Bundner Tagblat û Kovara Jinan a Les Femines beşdar bûn.

**Xebatên xwe dê çalaktir bikin**

Berpirsê Têkiliyên Derve yê Komeleya Çanda Kurd û Hevkariyê Bayram Yanik di destpêka civînê de der barê xebatên saziyê de agahî dan mêvanan û plansaziya komeleyê yên 3 mehên pêş jî hatin rawekirin. Yanik, bi bîr xist ku li bajarê Chur 250 malbatên kurd hene û der barê xebatên zimanê kurdî yên komeleyê de wiha axivî: "Gelê me yê li Chur dijî bi salan bi qedexeyên ziman re rû bi rû ma. Cara yekemîn bi riya saziya me dibistaneke kurdî ji bo gelê me yê li bajarê Chur hate vekirin. Em hêvîdarin ji niha û pê de jî di nava hevkariyê de em ê van xebatan çalaktir bimeşînin û bi pêş bixin."



**'Gelê kurd pêşverû ye'**

Nûnerên saziyan ên beşdarî civînê bûn der barê xebatên saziyên xwe de agahî dan û plansaziyên xwe aşkera kirin. Di civînê de têkildarî xebatên demê pêş yên têkildarî pirsgirêkên jinan, îstîsmara zarokan û ragihandina dewlemendiya çandan de hate guftûgokirin. Nûnera saziya mafê mirovan a bi navê Caritas ê Nadia Jelzin çavdêriyên xwe yên der barê kurdan de bi van gotinan anîn ziman: "Kurd gelekî rêxistinkirî ye. Di encama têkoşîna salan de jinên kurd gihîştine asteke pêşketî. Em dibînin ku di xebatên çandî yên tên meşandin de herî zêde kedê jin didin. Gelê kurd gelekî pêşverû ye." Di encama civînê de biryar hate girtin ku civînên hevkariyê ji 3 mehan carekê pêk werin, ji bo nasandina xebatên sazî û komeleyan pirtûkên nasandinê û broşûrên hevpar werin derxistin.

Di dawiya civînê de ku xwarinên kurdan ji mêvanan re hatin pêşkêşkirin ji aliyê 2 keçên kurd ve konsereke biçûk jî hate dayin. **CHUR / ANF**

## Di roja rizgariya Holandayê de Koma Çarnewa

Dewleta Hollandayê salvegera rizgarbûna xwe ya ji bin dagirkeriya Almanyaya Nazî ya Hitler di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de pîroz dike. Her wiha pîrozbahiyên ku li bajarê Wagenîngenê tê pîrozkirin de dê koma Çarnewa jî tevlî bibe.

Pîrozbahiyên roja rizgariyê li bajarê Zwolle bi tevlîbûna serokwezîr Jan Peter Balkenende dest pê kir. Serokwezîr Balekenende di merasîmê de axivî û li ser girîngiya azadî, serxwebûn û demokrasiyê sekinî û xwest ku her tim nirxên azadiyê bên parastin. Li seranserî welat li 40 derên cuda salveger dê bê pîrozkirin. Lewre jî dê ji 250 yî zêdetir jî hunermend tevlî şahiyan bibin. Şahî heta derengiya şevê dê berdewam bikin. Her wiha Koma Çarnewa jî dê tevlî şahiya ku li bajarê Wagenîngenê bibe. Li ser navê muzîka kurd dê Koma Çarnewa derkeve ser dikê. Şahî di bin bana Mîhrîcana Kleurrijke Oase pêk tên. Bernameya mîhrîcanê duh êvarê li Amsterdamê bi muzîka klasîk berdewam kir. **AMSTERDAM**

www.arsivakurdi.org

STENBOL

## Divê navnîşana stargehan bê veşartin

*PIŞTÎ* ku navnîşana stargeha jinan a Antalyayê aşkera bû gelek nîqaş hatin kirin û nûner û endamên rêxistinên jinan daxwaz kirin ku ji bo stargehê cihekî din bê amadekirin. Li Tirkiyeyê bi tevahî 52 stargehên jinan hene. Jinên ku dixwazin xwe ji şîdet û kuştinê biparêzin serî li stargehan didin. Her wiha divê navnîşana wan stargehan bê veşartin. Li Antalyayê grûbek bi hewldana muxtar daxwaznameyek ji walî re şand û li dijî stargeha jinan derketin. Endama Mor Çatiyê Fatma Budak, bal kişand ser hewldan muxtar. Budak diyar kir ku hejmara stargehan têra jinên mexdûr nake, lê yên heyî jî bersivê nadin hewcedariyê jinan. Budak, da zanîn ku divê navnîşana stargehên jinan bê veşartin.

AGIRÎ

## Tenîsvanên ciwan ên jin bi îdia ne

*JINÊN* ciwan ên li Dibistana Şevnişîn a Herêmî di futbolê de serkeftî bûn niha jî jinên ciwan hewl didin ku di tenîsê de jî serkeftina xwe nîşan bidin. Di turnuvayên ku ji hêla Wezerata Perwerdehiya Netewî ve tên organîzekirin de tîmên futbolê yên jinan serkeftî bûn. Niha jî jinên ciwan ji bo turnuvayên tenîsê xwe amade dikin. Turnuvaya tenîsê dê li Îzmîrê pêk bê. Dibistana Şevnişîn a Hamûrê ya Agiriyê 4 tîmên tenîsê têk birin û dê 7'ê gulanê berê xwe bidin Îzmîrê. Antrenorê tîmê diyar kir ku jinên ciwan bêtir di sporê de serkeftî dibin.

# Qedexeya li ser kurdî didome

**Girtî û hikûmxwarên jin diyar kirin ku li girtîgehê qedexeya li ser kurdî didome, qantîn tiştan buha difroşe, av her tim qut dibe û li girtîgehê lêgerîneke mirov aciz dike her tim pêk tê**

Girtî û hikûmxwarên jin, di nameya ku ji Şaxa ÎHD'ê ya Edeneyê re şandin de, diyar dikin ku li girtîgeha Karataşê ya Edeneyê binpêkirina mafan didomin. Girtiyan di nameya xwe de bal kişandine ser qedexeyên li dijî kurdî tên meşandin û anîn ziman ku ji ber qedexeya kurdî nikarin di telefonê de bi malbatên xwe re biaxivin. Girtiyan, destnîşan kirin ku tevî qedexeya kurdî, rojnamêyên kurdî jî nayên dayîn. Girtiyan, derbirîn ku tevî di giştînameyan de mafê hevdîtina navxweyî heye jî, rayedarên girtîgehê destûra vê yekê nadin û wan bi awayekî cuda derdixin sporê.

**'Leşker mudaxele dikin'**


Girtiyan bal kişand ser mudexaleya leşkeran û wiha gotin: "Di dema lêgerînên mehê carekê pêk tên de alavên me tên belavkirin û hemûyan davêjin erdê. Hemû tiştên di qawîşê de serobin dikin. Piştî lêgerînê qawîş dibe cihê talanê. Ligel girtîgeh a jinan e jî bi hejmarek zêde leşker tên lêgerînê. Leşker ji ewlehiya derve berpiryar in. Mafê wan tuneye ewqasî mudaxeleyî hundir bikin. Mînak cihên ku pêwist e jin lê binêrin jî leşker diçin mudaxele dikin û lê digerin."

**'Rê li ber nexweşiyan vedike'**

Girtiyan bilêv kir ku li qantîna girtîgehê tişt gelekî buha tên firotin û wiha dom kirin: "Em havîn û zivistanê pirsgirêka avê dijîn. Li girtîgehan nebûna avê rê li ber nexweşiyan vedike û tenduristiyê xirab dike." Girtiyan diyar kir ku ji bo pirsgirêkên heyî serî li midûrê girtîgehê didin lê daxwaza wan nayê qebûlkirin û wiha pê de çûn: "Rayedarên girtîgehê li hemberî pirsgirêkên heyî bêdeng dimînin. Ji bo çareserkirina pirsgirêkên heyî me gelek caran daxwazname ji Wezîrê Dadê re şand, me li dozger giliyê xwe kir, lê ji bo me tu bersiv nehat dayîn."

**Lêgerîna tenik pêk tê**

Parêzer Rehşan Aytaç Sola jî, anî ziman ku girtiyan gotiye di dema çûnûhatinê de lêgerîna tenik pêk tê. Sola, daxuyand ku ji ber muwekîlên wê Seval Gundogdu û Hulya Gerçek nasnameya ji aliyê girtîgehê ve hatiye dayîn winda kirine, rayedarên girtîgehê nahêlin derkevin hevdîtina vekirî. Sola, diyar kir ku dema pirtûk ji girtiyan re tên heta 10-15 rojan nadin wan û daxuyand ku rojname ji piştî 11-12 rojan digihêjin destê girtiyan. **EDENE / DÎHA**


GÖRÜŞME TUTANAĞI

Adana Cumhuriyet Başsavcılığının 2008/1183 Hz. numaralı dosyasında tutuklanan Hülya Gerçek ve Seval Gündoğdu ile yapılan görüşmede, Cezaevi idaresi tarafından verilen kimlik kartı alınmadığı gerekçesi ile "açık görüş" yapılmadığını, ayakkabılarının diğer tutuklulardan farklı olarak Hastaneye, revire, vs. gibi cezaevi çıkışlarında arandığını, cezaevine girip sırasında tüm elbiselerinin çıkarılmak istendiğini, kitaplarını cezaevine girdikten 10-15 gün sonra aldıklarını, gazetelerin 1-2 hafta sonra verildiğini, cezaevi idaresi ile yaptıkları görüşmelerde bu sorunların çözülmediğini beyan etmişlerdir. 17/04/2009

Seval Gündoğdu.

Av. Rehşan Aytaç Sola
R. Aytaç



## Bo Roksanayê çalakiya birçîbûnê

Rojnamevana amerîkî ya ku bi eslê xwe Îranî ye, li Îranê bi tawana casûstiyê hatibû girtin. Sabirî ji aliyê dadgeheke Îranî ve bi 8 sal cezayê zindanê hate mehkûmkirin. Roksana Sabirî dibêje ew ne casûs e û hemû tawanên ku li dijî wê hatine qeydkirin red kir. Bavê wê Riza Sabirî di daxuyaniyeke çapemeniyê de got, keça wî li wî geriya û jê re gotiye ku ew berî 5 rojan ketiye greva birçîbûnê. Dadgeheke Îranî wê tawanbar dike ku ew ji bo Amerîkayê li dijî Îranê casûstiyê dike.

Ji bo piştgiriyê bidin Roksanayê çalakiya birçîbûnê hate destpêkirin. Kampanyaya bi navê 'FreeRoksana' dê li her derê cîhanê bê birêvebirin. Di çarçoveya kampanyayê de greva birçîbûnê hate destpêkirin. Greva birçîbûnê Roja Azadiya Çapemeniya Cîhanê hate destpêkirin. Kampanya ji hêla Zanîngeha Northwesternê ve hate destpêkirin. Jin bi kampanyayê daxwaz dikin ku zextên li ser rojnamegeran bên rakirin û rojnamegerên girtî bêne berdan.

Roksana Sabirî Zanîngeha Northwesternê beşa rojanemegeriyê di sala 1999'an de qedand. Sabirî di meha çilê de li Îranê hate binçavkirin û piştre bi îdiaya sîxuriyê hate girtin. Ji hêla Dadgeha Şoreşê ya Tehranê ve 8 salan ceza lê hate birin. Sabirî di 21'ê nîsanê de dest bi greva birçîbûnê kir. **TEHRAN**

## Îranê jina 23 salî îdam kir

Hemû hewldanên rêxistinên parastina mafên mirovan bêencam man û dawiyê Îranê keçeke 23 salî idam kir. Dilara Darabî, ya ku di dema îdamkirinê de temenê wê 23 sal bû, tê îdiakirin ku, wê di 17 saliya xwe de cinayetek kiribû, wê demê Dilara 18 salên xwe temam nekiribû.

Îdamkirina Dilara Darabî bû sedema ku Îran careke din bi tundî, ji aliyê rêxistinên mafên mirovan ve û bi taybetî ji aliyê Rêxistina Efûyê ya Navnetewî (AI) ve bê rexnekirin. Tê îdiakirin ku Dilara, dema ku 17 salî bû, bi hevaleki xwe yê kur re, ku 2 salan jê mezintir bû, ketibûn mala xizmekî xwe û dizî kiribû. Wê demê, xizmekî Dilara bi kêrê hatibû kuştin. Di ifadeya xwe ya yekemîn de, Dilara sûcê xwe qebûl kiribû. Piştre poşman bibû, gotibû, ji ber ku wê texmîn dikir ku temenê wê biçûk e û ewê neyê îdamkirin, wê sûc girtibû ser xwe. Li ser bingeha îfadeya Dilara ya yekemîn dadgehê biryara îdamê da û ew tawanbar dît. Dilara roja înê hate îdamkirin. Rêxistina Efûyê ya Navnetewî (AI) di raporeke xwe de diyar kir ku, di 8 salên borî de, 42 iraniyên ku temenê wan di bin 18 salan de bû, hatine îdamkirin. Îdamkirina wê ji hêla rêxistinan ve bi tundî hate şermezarkirin.


Dilara Darabî

# Pêşbirka 'Bajarên dostên jinan'

Bi navê 'Mekan û bajarên dostên jinan' pêşbirkek tê organîzekirin. Di pêşbirkê de tê armanckirin ku ji bo jinan derfetên rihet bên avakirin. Her wiha ji bo şikandina nêrîna serdestiya cinsiyetî ev pêşbirk roleke girîng dilîze.

Bernameya Hevpar ya Pêşketin û Parastina Mafên Mirovan a Zarokên Keç û Jinan a Neteweyên Yekbûyî (BMOP), ji bo wekheviya herêmî projeyek bi vî rengî amade kir. Bi vê projeyê ji bo hewcedariyên jin û zarokên keç modelên xizmetê tên afirandin. Her wiha dê hewl bidin ku nêrîna cûdabûna cinsiyetê ji holê rakin. Proje dê li Îzmîr, Qers, Nevşehîr, Riha, Trabzon û Wanê pêk bê û dê ji bo herêmên din dê bibe mînak. Dê xwendekarên wekî beşa mîmarî, bajar, plansaziya herêmî û peyzaj tevlî pêşbirkê bibin. Her wiha di çarçoveya pêşbirkê de dê pêdivîyên jinan bên tespîtkirin û piştre proje bên amadekirin. Dê serlêdan heta 15'ê cotmehê bidome. Her wiha dê meha mijdarê encama pêşbirke bê aşkerakirin. **ÎZMÎR**



## Kevneşopiya 400 salî hilweşand

Helbestvana Îskoç Carol Ann Duffy di dîroka Îngilistanê de cara yekem nasnava 'Şair-i Azam' (Poet Laureate) girt û dîroka 400 salî xirab kir. Jina bi navê Ann Duffy cara yekem nasnaveke wisa girt û di dîrokê de cihê xwe girt.

Li Îngilistanê 400 sal in nasnava Poet Laureate heye û bi taybetî didin helbestvanên mêr, lê cara yekem jinekê ev nasnav girt. Ji salên 1600'an heta niha ev nasnav tê dayîn. Cara yekem jineke Îskoç ev nasnav wergirt. Duffy 53 salî ye û dê ji helbestvana Îngiliz Andrew Motionê werbigire. Piştî 10 salan Motion unvana xwe dê dewrî Duffyê bike. Di nava wêjeya Îngilistinê de unvaneke gelek girîng e û di sala 1617'an de ji hêla qralê yekem Charles ve hate dayîn.

Prof. Carol Ann Duffy Zanîngeha Metropolîtana Manchester li ser helbestan dixebite. Duffy helbestên ku heta niha nivîsandine di pirtûka 'Hevsera Cîhanê' de berhev kir. Pirtûka helbestan a Duffy li cîhanê navdar e. Her wiha piştî ku Duffy ev unvan wergirt dê her sal ji bûtçeya dewletê 5750 sterlîn pere bigire.

Dê 10 salan vê unvanê bigire. Her wiha Duffy dê ji bo endamên malbata qral nivîs û helbestan binivisîne. Her wiha di rojbûna 80'emîn keybanûya duyem Elizabet de helbestek nivîsandibû. Carol Ann Duffy di helbestên nûjen de roleke mezin digire.

Duffy di sala 1955'an de li bajarê Glasgowa herêma Gorbalsa Îskoçyayê ji dayik bû. Heta niha bi navê 'Tazîbûna jinê','Firotina Manhattanê', 'Cîhaneke bêmerhamet', 'Hevsera Cîhanê', 'Rastiya Jinîtiyê' û 'Nobedariya Hezkirinê' dîwanên wê hatine weşandin. Her wiha ji bo zarok û şanoyê jî nivîsar û gotar nivîsandine. **LONDON**


www.arsivakurd.org

Hawar
6 Gulan 2009 Çarşem



# Dilxwazên xwezayê platform damezirandin











Wêne: www.xweza.org

**Ji bo parastina xwezaya Kurdistanê dilxwazên xwezayê ketin nava liv û tevgerê. Komeke dilxwazên xwezayê Platforma Xwezayê ya Mezopotamyayê damezirandin**

Komeke dilxwazên xwezaparêz Platforma Xwezayê ya Mezopotamyayê damezirand û dest bi xebatên xwe kirin. Dildaxwazên xwezaparêz diyar kirin ku wan ji fikra konfederalîzma demokratîk sûd girtine û ji ber ku li Kurdistanê di warê xwezayê de rêxistin kêm e wan jî xebateke wisa dane destpêkirin.

Platforma Xwezayê ya Mezopotamyayê ku bi dirûşma "mirov xwezayek e, xweza miroveke biçûk e" hatiye damezirandin bi taybetî di destpêka meha nîsanê de bi çandina daran hate rojevê. Platforma ku ji aliyê Îbrahîm Bakir û Volkan Bora ve hatiye damezirandin ji dilxwazên xwezaparêz pêk tê. Platforma bi navê MEDOP xebatên xwe li ser malpera www.xweza.org dimeşîne. Endamên platformê di heman demê de endamên rûpela webê ne jî. Bi vî rengî xebatên xwe û nûçeyên der barê xwezayê de bi hev re parve dikin.

Platform nêrîna xwe ji fikra konfederalîzma demokratîk digire. Îdiaya wan ew e ku jihevqutbûna mirov û xwezayê kêm bikin.

Her wiha endamên platformê dibêjin ku armanca wan ew e ku li hemberî xwezayê rêzê nîşan bidin û fikra ku mirov parçeyekî xwezayê ye û bi milyonan sal in bi hev re dijîn di nava civakê de pêş bixin.

**Çima Mezopotamya?**

Platformê bi taybetî navê Mezopotamyayê girtiye. Vê yekê jî wiha îzah dikin: "Ji ber ku tiştên dema neolîtîkê bûn bingeha şoreşa çandiniyê û dewletên bajar. Ev pêşketin li ser axa Mezopotamyayê pêk hatin. Çavkaniya hemû şaristaniyan li Mezopotamyayê veşartiye."

Endamên platformê dibêjin ku di roja îroyîn de şaristaniya têkilyên xwe bi xwezayê re qut kiribe û di nava sîstema kapîtalîzmê de feraseta "ekolojiya faşîst" diqedimînin li ser civakê. Der barê vê mijarê de jî wiha tê gotin: "Ji ber vê yekê armanca me ew e ku em xwezaya Mezopotamyayê biparêzin û vê axê di nava sînorê konfederalîzmê de ji nû ve şîn bikin."

**Dê navên kurdî berhev bikin**

Platform dibêje ku di warê rêxistina xwezayê de jî kêmasî heye û wan ji ber vê yekê jî xebateke wisa dane destpêkirin û armanca xwe wiha tînin ziman: "Platforma Xwezayê ya Mezopotamyayê, li ser cureyên nebat û sewalên li ser axa Mezopotamyayê lêkolînê dike, ji bo ku arşîva wan bê girtin projeyan pêş dixe û di vî warî de agahiyan dide gel. Di nava armancê platformê de amadekirina ansîklopediya navên nebat û sewalan ên bi kurdî, projeyên ji bo çandina daran û ji bo parastina cureyên sewalên ku kêm dibin hene. Her wiha beşdarbûna çalakiyên li hemberî bendavan jî heye."

Malpera platformê ligel ku hatiye vekirin jî pir dewlemend e. Di malparê de nûçeyên xwezayê, ansîklopedî, nivîsên der barê xwezayê de, wêne, gotar, kuantum, Mezopotamyayê beşa vîdeoyê û hwd. heye. AMED

## Li bajarê xwe dibin kêmar

Li Roterdama Holandayê piştî Sûrînamiyan ji Tirkiyeyê nêzî 50 hezar kes, ji Morockoyê 40 hezar kes hene.

Hate ragihandin ku li bajarê Hollandayê li Rotterdamê hejmara holandiyan kêm dibe û dikin bibin kêmar li bajarê xwe.

Li gorî buroya îstatîstîkan nifûsa bajêr 588 hezar e û ji sedî 52'yê wê holandî û ji sedî 48'ê wê biyanî ne. Li gorî buroya îstatîstîkê heke wisa dom bike di sala 2012'yan de hejmara biyaniyan ê ji holandiyan zêdetir bibe.

Li Roterdamê piştî Sûrînamiyan ji Tirkiyeyê nêzî 50 hezar kes, ji Morockoyê 40 hezar kes hene. Hejmara kesên ku herî pir zêde dibin morokî ne û niha ji şaredarê bajar yekî morokî Ahmet Abu Taleb e. AMSTERDAM

## Koçer nikarin derkevin zozanan

Bi hatina biharê koçerên ji herêma Colemêrgê bi boneya xwedîkirina pezê xwe tên navçeya Silopiya Şirnexê cardin rastî qedexeyan tên. Koçerên diyar dikin ku sewalkarî hatiye asta tunebûnê, bi tundî nerazîbûn nîşanî qedexeyên zozanan dan. Koçeran anî ziman ku ji ber zordariya leşkeran nikarin sewalên xwe biçêrînin.

Koçerên ji deverên din tên navçeya Silopiya Şirnexê ji ber qedexe û astengiyên leşkeran nikarin pezê xwe biçêrînin. Koçerên ji deverên dûr tên li şûna derkevin zozan û çiyan, cardin bi neçarî li deştan dimînin. Gelek sewalên koçeran jî bi boneya destûr ji bo bikaranîna çekan nayê dayîn, ji hêla guran ve tên telefkirin. Hemwelatiyê bi navê Şirîn Kaya (60) diyar kir ku ji par heta niha ji Colemêrgê hatiye naçeya Silopiyê û wiha axivî: "Bi hatina biharê em dixwazin derkevin zozanan. Lê wekî her dem cardin qedexeya leşkeran jî dest pê kir. Sewalên me birçî dimînin û ji ber vê yekê randimanekê jê nagirin. Zozanên bi salan e em bi kar tînin niha leşker bi hinceta qada operasyonê ye asteng û qedexe dikin. Bi dehan kîlometre em sewalan dibin û paşê diçêrînin. Em ji van qedexeyan neçar bûn. Em li benda hatina biharê dimînin lê dema bihar tê vê carê zordarî dest pê dikin. Ji bo cihên em çadiran lê vedikin jî bi neçarî em kirê didin. Ji bo cihê çadir û guhorê min îsal 15 hezar TL dan. Dema em diçin zozanan jî zordarî li ser me tê meşandin. Em her roj zirar dikin."

Mustaf Duman jî diyar kir ku ligel nahêlin derkevin zozanan niha jî ji deştên lê sewalên xwe xwedî dikin derdixînin û ev tişt anîn ziman: "Wisa li me bikin em dê ji birçiyan bimirin. Em demekê li nêzîk çiyayê Cûdî man. Lê ji ber ku destûr nadin em çek li cem xwe bihêlin, gelek sewalên me rastî telefkirina guran hatin. Gur tên lê em nikarin wan asteng bikin. Em nikarin ne xwe ne jî pez biparêzin. Em neçin zozanan ji bo me her tişt dê bi dawî bibe. Ji ber ku zozan çavkaniya jiyana me ne. Lê leşker zordariyeke mezin li me dikin. Leşker dibêjin 'Vira ne memleketê we ye ji vir herin'. Ev ne rast e. Ev memleketê me ye. Vira axa me ye. Mafê me ye ku em sewalên xwe bînin vir. Tu cihê me yê din jî tune ye. Dibêjin herêma operasyonê ye û me asteng dikin. Jixwe em bi keda xwe ancax zikê xwe têr dikin. Em neçin zozanan em dê perîşan bibin."

Taze Ozatak jî diyar kir ku ji şîr, mast, pêxwarin, keşk û rûn çêdikin û wiha pê de çû: "Lê em van hilberînan gelek erzan difiroşin. Ji ber qeyrana aborî her tişt pir erzan bû. Kîloya pêxwarinê 4 TL ye. Em nikarin biçin zozanan jî. Em nizanin dê çi li me bê. Bi derfetên kêm em dixwazin bêyî muhtacî kesê bibin debara xwe bikin. Lê nahêlin. Me asteng dikin û zordariyê li me dikin." ŞIRNEX

## Şivan jî perîşan bûn

Bandora krîza aborî li tevahiya beşên civakê belav dibe. Ji van beşan yek jî şivan in.

Şivanên li Pazara Şivanan a li rex Mizgefta Haciosman a li Wanê berhev dibin heta êvarê li benda kar dimînin. Piraniya welatiyên ji ber koçberiyê mexdûr bûne yên bajarên wekî Colemêrg, Sêrt û Şirnexê hatin heta êvarê li benda kar dimînin. Welatiyê razî çarêka heqdestên par dibin jî nikarin kar peyda bikin. Şivanên par ji bo mehekê bi 2 hezar TL kar peyda dikirin, îsal nikarin bi 400 TL'î kar peyda bikin. Abdullah Korkmaz ku ji navçeya Cizîra Şirnexê mehek berî niha hatiye Wanê diyar kir ku li kuçeyan neçar bûye. Kazim Yîgît jî ji bo şivantiyê ji Silopiyê hatiye Wanê. Yîgît anî ziman ku mexdûriyeta wan pir zêde ye û ev tişt anîn ziman: "Xwediyên pez par ji bo mehekê 2 hezar TL didan lê îsal 500 TL jî nadin. Xwediyên pez jî di rewşeke xirab de ne. Nikarin şivanan bigirin. AKP'ê bi tevahî welatî şelandin. Dixwazin gel bi birçîbûnê terbiye bikin. Em dixwazin vegerin gundên xwe û hilberînê bikin."

Nacî Aslan jî wiha got: "Em êdî nikarin li malbata xwe binêrin. Rojê em 100 kesî zêdetir tên vir. Bi mehan em radiwestin." Xwediyê kerî Ahmet Teker jî diyar kir ku salên borî ji bo 500 sewalên xwe şivan digirt lê êdî ew jî nikarin şivanan bigirin. WAN